*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (518) 22-05-2026



## Hewcehiya rawestana li dijî darvekirin û parastina canê girtîyên siyasî!

N. Îbrahîm Lacanî

Di wan heftî û mehên dawî de, rewşa mafên mirovan li Îranê heta diçe zêdetir dibe cihê nîgeraniyê. Nûçeyên ku ji navxweyê welat tên belavkirin, nîşan didin ku pêvajoya darvekirin û cezaya îdamê ya girtîyan bi lezgîniyek zêde berdewam e. Gelek ji girtiyên siyasî û kesên ku di tevgerên nerazîbûna xelkê de hatine girtin, niha bi metirsiyeke cidî û nêzîk a darvekirinê re rûbirû ne.

Dom» R:4



## Şerê Amerîka û Îsraîlê li dijî Îranê «şerê me ye» yan «derfet e»?

N. Dr. Mîro Eliyar

Li pey peydabûna şerê Amerîka û Îsraîlê li dijî Îranê, di nav Kurdên Rojhilat de du nêrîn û xwendinên cuda derketin holê: Partî û beşek ji çalakvanên siyasî ragihandin ku ew şer, ne şerê me ye.Beşekî din li ser vê bawerê ne ku ew şer, şerê me ye jî; ji ber ku li dijî Komara Îslamî ye ku tepeserkarê gelê Kurd e û yên ku hatine kuştin û tên kuştin, 47 sal in me dipelçiqînin, rehmê bi piçûk û mezinên Kurdan nakin û mafên Kurdan binpê dikin. Lawazkirina rejîmê di berjewendiya Kurd de ye....

Dom» R:3



## Gola Urmiyê, Di navbera mirina siyaset û jiyana

N. Serbest Urmiyê

Di dîroka neteweyan de gelek caran hatiye dîtin ku nemana dîktatorekê ne tenê dawiya desthilatdariyeke zordar bûye, belku bûye destpêkek bo ji nû ve jiyana mirovan û jîngehê. Dema ku tê gotin “mirina dîktator destpêka jiyanê ye”, ne tenê şiroveya hesteke xweş e ku di dil û hindurê gelê bindest û civaka zor lêkirî de serhildide . . . .

Dom» R:6




# Hêz û helwêst ji ku çavkanî digre?



Dema ku kesek yan aliyek biryarekê dide, yan helwêstekê li hember tiştekê yan bûyerekê de digre, berê de ev gotine hatiye gotin ku dibêjin: Eva pişta wî bi çi yan kê germ û qahîm e wiha dibêje? Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li heyamê hemî temenê xwe yê 80 salî de hertim xwediyê helwêst û biryara xwe bûye û nekariye li hember çi tiştekê de ku li derdora vê diqewimin, bê helwêst be û bi hişmendiya xwe a siyasî û netewî, bi berhevdana xwe a serbixweyî a siyasî û biryar danê, biryar daye û helwêsta xwe ragihandiye.

Ger em wegerin bo hema pirsyara serve ku dibêjin bi çi û kê piştqahîme wiha dibêje, bê guman Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li hemî temenê xwe de, her ji roja avabûnê ve heya niha, heçî biryarek dabe û heçî helwêstek girtibe bera xwe, tenê û tenê bi piştqahîmî bi piştewaniya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, Siyaseta rasteqîne a xwe û îradeya bihêz a Kadr û Pêşmerge û Endam û alîgirên xwe bûye û bi serbilindî û bi îrade ve xwediyê biryar û helwêsta xwe bûye.

Hizbek ku xwediyê pêgehekî bê mînak li nava civatên xelkê Kurdistanê be, Hizbek ku xwediye siyaseta serrast be, Hizbek ku xwediya serbixweyî ya biryardanê be, Hizbek ku xwediyê dîrokekî pirşengdare pitir ji 8 dehik xebat û berxwedanê be û bi hemî dijvariyan û qonaxên sexte xebatê re derbas bibe, Hizbek ku xwediyê zêdetirîn Endam û Alîgir û Kadr û Pêşmergeyên xebatkar be, Hizbek ku vê bingeha gihandina dengê mafxwaziya gelê Kurd gihandibe cîhanê û niha jî dîplomasiya tev Kurdan li ser esasê heman bingehê berdewam dike, Hizbek ku baveriyekî kûr bi dêmokrasî û vekhevî û sikolarîzmê heye, Hizbek ku li pêxema armancên bilinde gel de bi hezaran şehîdan li rêka xebatê de dane û serweyî hemiyan Hizbek ku rêberên mezin ên wek Pêşewa û Qasimlo û Şerefkendî pêşkêşî rêka rizgariyê û armancên gel kirine, Bê guman hizbek dibe ku bi piştqahîmî û baverbixwebûnê ve hertim helwêstê bigre û biryarê bide.



## Mistefa Hicrî: Rejîmekî îdeolojîk guhertin bi ser de nayê

Roja Duşemî 21’ê Banemêra 1405an a Rojî, li ser daxwaza Navenda Olof Palmê li bajarê Sêtokholmê, rêzdar Kak “Mistefa Hicrî” Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bi hevrêtiya çend kesan ji endamên komîteya giştî ya Hizbê li Swêdê û berpirsê Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Rojhilatê Kurdistanê – Komîteya Swêdê, serdana wê navendê kir û ji aliyê berpirsên wê navendê ve bi germî hate pêşwazîkirin.

Ev hevdîtin li avahiya wê navendê ku bi navê mala Sosyal Demokratên Swêdê tê naskirin, pêk hat.

Di wê hevdîtinê de “Oskar Ernêroot” berpirsê wê navendê û xatû “Sana Êilyason” nûnera navneteweyî yê wê navendê û hejmarek ji ciwan û çalakvanên Sosyal Demokrat beşdar bûn.

Oskar Ernêroot digel bi xêrhatina rêzdar Sekreterê Giştî yê Hizbê got: “Em ji nêz ve çavdêriya bûyerên Îranê dikin. Hizba we û Sosyal Demokrat destexweşkên hev in.”

Dom» R:2

## Mistefa Hicrî: Rejîmekî îdeolojîk guhertin bi ser de nayê



Roja Duşemî 21'ê Banemêra 1405an a Rojî, li ser daxwaza Navenda Olof Palmê li bajarê Sêtokholmê, rêzdar Kak "Mistefa Hicrî" Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bi hevrêtiya çend kesan ji endamên komîteya giştî ya Hizbê li Swêdê û berpirsê Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Rojhilatê Kurdistanê – Komîteya Swêdê, serdana wê navendê kir û ji aliyê berpirsên wê navendê ve bi germî hate pêşwazîkirin. Ev hevdîtin li avahiya wê navendê ku bi navê mala Sosyal Demokratên Swêdê tê naskirin, pêk hat.

Di wê hevdîtinê de "Oskar Ernêroot" berpirsê wê navendê û xatû "Sana Êilyason" nûnera navneteweyî yê wê navendê û hejmarek ji ciwan û çalakvanên Sosyal Demokrat beşdar bûn.

Oskar Ernêroot digel bi xêrhatina rêzdar Sekreterê Giştî yê Hizbê got: "Em ji nêz ve çavdêriya bûyerên Îranê dikin. Hizba we û Sosyal Demokrat destexweşkên hev in."

Kak Mistefa digel spas ji bo dana wê derfetê got: "Komara Îslamî di vî şerî de ji her alî ve derb û lêdanek gelek giran lêketiye. Piraniya berpirsên payebilind, ji rêberê bilind ve heta gelek fermandarên din ên leşkerî û îtilaatî yên, xwe ji dest dane."

Barê giraniya derman û pêdiviyên din ên jiyanê bi sedema şer gelek li ser xelkê giran bûye. qutkirina înternetê bûye sedema qutbûna peywendiya xelkê navxweyî bi civaka navneteweyî re. Tenê wan Kesan înternet heye ku girêdayî rejîmê ne. zilim û zora rejîmê li ser çalakvanên siyasî bi tohmeta hevkarî bi Îsraîlê re û gelek hêcetên bêbingeh ên din, piştî şer zêde bûye.

Kak Mistefa di bersiva pirsiyekê de li ser çawahiya hevkariya wê navendê ji bo doza rewa ya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê got: "Di destpêkê de welatên rojavayî bi nermî bi wê rejîmê re reftar kirin, lê dîrokê nîşan dan ku Komara Îslamî nayê guhertin. Ji ber ku rejîmekî îdeolojîk nayê guhertin. Em bawer dikin ku welatên rojavayî pêdivî ye li ser guhertina rejîmê bifikirin."

Li ser cudahiya di nêrînên welatên Ewropayî û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de li hember şerê dijî Îranê, rêzdar Sekreterê Giştî got: "Îran ji bo berjewendiya xwe mifah ji natebayetiya di navbera Amerîka û Ewropayê de wergirtiye. Em bawer dikin ku Navenda Olof Palmê dikare li ser siyaseta derve ya hikûmeta Swêdê kar bike.

Ew dikarin alîkariya wan jin û zarokan bikin ku bi sedema mûşek û dronbaranan bûne penaber û di rewşeke pir nexweş de dijîn. Alîkariyek din jî ew e ku bikarin beşek ji wan malbatan wek penaber wergirin û ji aliyê siyasî ve jî dikare li hember êrîşên Komara Îslamî helwest hebe."

Di beşek din a vê hevdîtinê de Kak Mistefa li ser alîgirên rejîmê û wê yekê ku gelo şer bûye sedema dûrketina wan ji rejîmê an na, got: "Rejîmê hemû îmkanatên xwe ji wan re daniye û ji ber vê yekê heta niha negihiştine wê baweriyê ku ji rejîmê dûr bikevin. Ji bo ku rejîmên dîktatorî bikefne qedeman, hewceye ku gel bi awayekî berfireh bên ser şeqaman, lê ji ber tundûtîjiyên rejîmê yên li hember xwenîşanderan, hemû rê li pêşiya xelkê hatine girtin. Ji ber vê yekê êrîşa derve pêdivî ye. Wek çawa ku rejîma Sedam Huseyn hat hilweşandin."

Kak Mistefa li derheq bûna alternatîfekê ji bo piştî herifîna Komara Îslamî got: "Em di çarçoveya cografiyayek diyarkirî de li Îranê çalak in û sêyem neteweya herî mezin a nav Îranê de ne, û em nikarin bi tenê rejîmê sernixûn bikin.

Kongireya Neteweyên Îrana Fêderal heye û niha jî em bi hêz û kesayetiyên din ên Îranê re mijûlê avakirina alternatîfekê ne."

Sana Êilyason di dawiyê de got: "Em rêz ji têkoşîna we digirin û baş dizanin ku hûn yek ji hêzên herî çalak û bibandor ên Kurdistan û Îranê ne."

## Hevdîtina Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat digel du endamên Parlamena Swêdê

Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, di berdewamiya dîtin û hevdîtinên xwe yên dîplomatîk de li welatê Swêdê, civîneke girîng digel endamên Parlamena Swêdê û Tora Swêdî-Kurdî pêk anî.

Roja çarşemiyê 24ê Banemera 1405a Hetavî, birêz Kak Mistefa Hicrî digel birêzan "Leif Nysmed" û "Kadir Kasirga", endamên Parlamena Swêdê ji Partiya Sosyal Demokrat û endamên Tora Swêdî-Kurdî di parlamena wî welatî de civiya.

Di destpêka dîtinê de, endamên Parlamena Swêdê xweşhaliya xwe bi vê dîtinê dane xuya û ragihandin ku ew ji nêzîk ve çavdêriya buyer û guhertinên piştî şerê Amerîka, Îsraîl û Îranê dikin. Parlamenterên Swêdî nîgeraniya xwe ya kûr li derheq rewşa hevwelatiyên sivîl, bi taybetî jin û zarokên hêzên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê ku ji ber êrîşên Komara Îslamî ketine ber metirsiyê, nîşan dan û tekez kirin ku ew ê bi her awayî hewla rawestandina van êrîşan bidin.

Kak Mistefa Hicrî keyfxweşiya xwe ji bo vê dîtinê diyar kir û amaje bi peywendiyên dîrokî yên di navbera Hizba Demokrat û Partiya Sosyal Demokrat a Swêdê de kir, ku di niha de her du alî endamên Hevpeymaniya Navneteweyî ya "Progressive Alliance" (Hevpeymaniya Pêşverû) ne.

Sekreterê Giştî yê Hizbê herwisa rêz û pêzanîna xwe pêşkêşî kar û çalakiyên Tora Swêdî-Kurdî di Parlamena Swêdê de kir.

Birêz Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat di parekî din a axaftinên xwe de, sedemên terîk û tenê mana Komara Îslamî di asta navneteweyî de şîrove kir; ji wan: piştgirîkirina ji terorîzma dewletî, geşepêdana hêzên nîyabetî (proksî), herêşeya ji nav birina Îsraîlê û hewldan bo destpêragihîştina bi çeka navokî.

Kak Mistefa Hicrî basê tepeseriya bêrehmane ya rêjîma Îranê li navxweyî û girtin û kuştina berfireh a xwenîşanderan û wek nûtirîn nimûneya tawanên rejîmê ragihand: "Tenê di dema kurt û du şev û rojên heyva Befranbara borî de, zêdetir ji 30 hezar kes ji aliyê Komara Îslamî ve hatine komkujkirin."

Parlamenterên Swêdî amaje bi wê kirin ku aliyekî seranserî û pawanxwaz (monopolîst) ê opozisyona Îranî bi propagandayeke berfireh rewşekî yekalî li Rojava dirust kiriye ku rê nade dengê rastî yê pêkhateyên din ên Îranê bête bîstin. Wan tekez kir ku Tora Swêdî-Kurdî dixwaze bibe dengê wan aliyên ku hewla fetisandina dengê wan tê dan û daxwaza hevkariya zêdetir ji Hizba Demokrat kirin. Herwisa amadebûna xwe nîşan dan ku di paşerojê de civîneke giştî ji bo Sekreterê Giştî yê Hizbê di nav Parlamena Swêdê de rêkbixin daku hemû partiyên Swêdî ji nêzîk ve agahdarî ra û nerîna Hizba Demokrat û Hevpeymaniya Hêzên Siyasiye Kurdistana Îranê bin.




Kak Mistefa Hicrî di vê barê de rohn kir ku mezinbûna wê aliya pawanxwaz ku îddîaya vegerîna bo pêş sala 1979an dike, tenê ji ber piştgiriya darayî û şepêleke reklamî ye, ne ku ji ber hindê be ku xelkê Îranê wan bixwazin; çimku gelên Îranê bixwe li dijî wê sîstemî rabûne û serî hildane.

Sekreterê Giştî yê Hizbê tekez kir ku Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê û Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, her cure hikûmeteke takkesî û pawanxwaz red dikin û daxwaza Îraneke demokrat li ser bingeha federalîzmê dikin. Wî ragihand ku niha digel hêzên demokrat ên din ên Îranê mijûlî pêkanîna hevpeymaniyeke giştgir in ku heta niha li vê derheqê de gelek civîn digel hêz û aliyên siyasî yên opozîsyonê û hevalbendên xwe li encam dane.

Di dawiyê de, Kak Mistefa got ku pêgeha Başûr û Rojavayê Kurdistanê di asta navneteweyî de naskirî ye, lê Rojhilatê Kurdistanê di medyayên cîhanî de heta radeyekê hatibû jibîrkirin, ji ber wê jî armanca Hizbê ew e ku dengê pir ji derd û mafxwazê vê beşa Kurdistanê bigihîne raya giştî ya cîhanê.

Cihê amajê ye, her di çarçoveya dîtinên xwe de li welatê Swêdê, birêz Sekreterê Giştî çav bi rojnamevan û kesayetiya diyar a Kurdî li wî welatî, birêz "Kurdo Baksi" ket.

# Şerê Amerîka û Îsraîlê li dijî Îranê «şerê me ye» yan «derfet e»?



N. Dr. Mîro Eliyar

Li pey peydabûna şerê Amerîka û Îsraîlê li dijî Îranê, di nav Kurdên Rojhilat de du nêrîn û xwendinên cuda derketin holê: Partî û beşek ji çalakvanên siyasî ragihandin ku ew şer, ne şerê me ye.
Beşekî din li ser vê bawerê ne ku ew şer, şerê me ye jî; ji ber ku li dijî Komara Îslamî ye ku tepeserkarê gelê Kurd e û yên ku hatine kuştin û tên kuştin, 47 sal in me dipelçiqînin, rehmê bi piçûk û mezinên Kurdan nakin û mafên Kurdan binpê dikin. Lawazkirina rejîmê di berjewendiya Kurd de ye û derfetekî baş bo Kurdan afirandiye ku di eniya Amerîka û Îsraîlê de bikevin nav şer de.
Bi baweriya min, bi hemû van nêrînên rast û di cih de jî, kuştina komek ji berpirsên siyasî û leşkerî yên rejîmê bi awayekî otomatîk şer nake şerê Kurdan jî, lê belê dike derfet!
Beşek ji alozî û cudahiya nêrînan dibe ku vegere bo cudabûna naveroka du têgeheştinên şerê hevpar û derfetê ku li şûna hev tên bikaranîn.
Heke armanca wî şerî, bi biryardarî rûxandina Komara Îslamî û piştgirîkirina li hatineserkara sîstemeke demokratîk ba, wê armanca hevpar Kurd jî dikir şirîkê şer. Wê demê, dikaribû gelek rîskan bide ber çavê xwe. Lê armanca ragihandî ya şer ne rûxandina rejîmê ye.
Ji bo zelalbûna mijarê, bila em hest û sozê vêde danên û bi çend pirsan ji mentiqê alîkariyê bixwazin:
Donald Tiramp çend caran mehta rêberên "zîrek û têgihiştî" yên niha yên Komara Îslamî kiriye, danûstandinê bi wan re dike û bi niyet e ku bi wan re li hev bike. Herwisa, Tiramp bi eşkere ragihand ku şerê wî bi Komara Îslamî re ne ji bo dabînkirina demokrasiyê ye, ji bo wê ye ku rejîm nabe bibe xwediyê çekên navokî! Roja 13'ê Gulanê ya 2026'an jî Wezîrê Şer ê Amerîka ragihand: " Yêk ji armancên Amerîka ev e, ku Komara Îslamî negihe çekên navokî." Baş e, heke li hev bikin û Komara Îslamî bimîne, ma em her dibêjin "şerê me ye jî"? Heke wisa be, me şer ji bo guhertina zordariya li ser xwe kiriye û me şer ji bo şer kiriye!!
Herwisa, çend roj berê nûçeyek belav bû ku karbidestên Amerîkayê li ser daxwaza Îsraîlê çend caran bi Riza Pehlewî re rûniştine. Em dizanin ku Îsraîl jî bi eşkere û bi dizî alîkariya seltenetxwazan dike.

De, heke sibe bi kûdetayê Riza Pehlewî anîn ser desthilatê, ma di wê rewşê de jî rewa ye em bêjin "ew şer şerê me ye", bê qeyd û şert?!

Amerîka jî dizane ku heke rejîm di wî şerî de "qisir" derkeve, ji bo xelkê Îranê bi giştî û bi taybetî ji bo neteweyên ne-Fars û ji ber buxtanên kak Tiramp bi taybetîtir bo Kurdan, dê bibe karesat. Nexwe, di wî şerî de armanc û pirsa piştî bidawîbûna şerî bo me Kurdan diyarker e û divê li ber çav bê girtin.

Paşê, gelo di destpêkirin û bidawîkirina şerî de roleke me hebûye û dê hebe? Gelo Amerîka bo sazan bi Tehranê re pirsyarekê bi me dike û daxwazeke me li ber çav digire? Li ser êrîşên berdewam ên rejîmê bo ser partiyên me dengê xwe derdixe û pêvajoya rêkeftina bi rejîmê re rawestîne? Heya rawestandina êrîşên ser Kurdan dike mercekî rêkeftinê?

Li ser erdê waqiî ne bi dirûşm, gelo Kurd ew hêz e ku çarenûsa şerî biguherîne, ji Kurdistanê hezar kîlometre bibire û biçe Tehranê rizgar bike? Heke ew hêz e, çawa ye tevî xebat û qurbanîdanekî zaf, 47 sal in rejîm di cihê xwe de ye?!
Em hemû dizanin ku bersiva hemû van pirsan negatîf e! Her ku li hev kirin, karê Amerîkayê bi Kurdan namîne û wê demê Tiramp dibêje: "Min pere û çek dane wan ku şer ji min re bikin" – tiştа ku ji Kurdên Rojavayê re jî got!

Diyar e gazinde kirina ji Amerîka û Îsraîlê û daxwaza parastinê ne di cihê xwe de ye. Tu welatek partiyên Kurdistanî bi wê belavbûn û perîşaniya niha wekî hevpeyman û hêzeke bi bandor nabîne ku xwe li ser xirab bike. Kurd xwe wekî "şerkerê baş" nasandiye, ne wekî tevgereke siyasî ya demokratîk û xwedî stratejî. Loma, Amerîka û Îsraîl jî Kurdan tenê bo şer dixwazin.

**Amerîka heta amade nebû ku rawestandina êrîşa ser partiyên Rojhilat bike mercekî lawekî yê agirbesta bi Îranê re!**

Êraq û Kurd dema xwe de li dijî Îranê di şer de bûn, lê ew jî ne şerê Kurd bû, çun armanca şeran cuda bûn. Derfetek bo partiyan afirî bo bihêzkirina xwe û tevgerîn di beranberî Komara Îslamî de ku jê sûd wergirtin.



Her wê demê Şehîd Dr. Qasimlo di daxuyaniyekê de ragihand ku: "Heke Komara Îslamî amade be xudmuxtariyê di yasaya bingehîn de bi cih bike, em amade ne mil bi milê artêşa Îranê sinûran biparêzin.

**Wateya wê helwestê ew e ku Kurd şer bo maf û dabînkirina berjewendiya xwe dike, ne ji bo xudî şer. Nexwe, em dikarin bêjin wî şer jî derfetek bo Kurdan afirandiye. Lê axir derfet jî ji xwe re nabe destkeft û maf: Tu dibe bikaribî sûdê jê derfetê wergirî.**

Gelo bi vê rewşa niha, Kurd şiyana sûdwergirtina ji wê derfetê heye? Bersiva wê pirsa girîng dibe ku karnameya "Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê" bide:

Gelo "Hevpeymanî" di wê rewşa dijwar de kariye nûnertiyeke hevpar pêkbîne ku di asta navneteweyî de zimanê Kurdê Rojhilat be? Hêza pêşmergeyê partiyên endamên hevpeymaniyê li hev civandiye?

Planeke hevpar bo roja vegera bo Rojhilat û birêvebirina Kurdistanê darêştine ku her li ser sînor tûşî pevçûnan nebin? "Hevpeymanî" heta nekarî bi beyaneke hevpar gotinên Tiramp ên derbarê pêdana çekan bi partiyan red bike (her partiyekê bi cuda daxuyanî dida!).

Di civîna Îraniyan de li Londonê, sê aliyên "Hevpeymaniyê" beşdar bûn, lê ne tenê nûnertiya hevpar bo wan nehatibû diyarkirin, heta hevahengî jî nebû û her yekî gotinek dikir.

Wekî ku çûbin Farsan dildar bikin ku em Kurd şiyan û îradeya me ya yekgirtinê nîne û bi dengekî parastina mafên xwe nakin!
Derfet bi zerfiyet û hêz û stratejiya hevpar sûd jê tê wergirtin; faktorek ku di cîhan û têkiliyên îro de tu aliyek, heta zilhêz jî, jê bêniyaz nîn in û berdewam hewl bo didin. Bi dirûşman tiştek ji derfetê şîn nabe.

Girîng: Xebata rizgarîxwaz divê li gorî ewlewiyetê gavan biavêje û di serî de pêwîst e nexşeya mala xwe rêk bixe û yekgirtî û tebayî di nav rêzên xwe de dabîn bike, wê demê dibe hêza xwedî hitbar tê hesibandin.

Nexwe her aliyek tûşî wê tewehuma kujer bibe ku bi tenê dikare bersivderê rewşê be û li ser kêşeyên çaverêkirî zal bibe, digel xwe, tevger û berjewendiya Kurdê Rojhilat di qopiyê de niqum dike.

Çek û hêza leşkerî girîng in, lê girêdana çarenûsa tevgera Kurdistanê tenê bi çekê û dîtina îtibar û rizgariyê tenê di lûleya tifingê de, her karesatê jê derdixe. Heke me ew kir, her wekî tîmeke çekdar em tên dîtin û pir bi hêsanî tên wêdedan û muamile li ser me tê kirin bêyî ku lêçûnek bo bazirganîker hebe. Her ew ji me re dimîne em hawar bikin îxanet li me hatiye kirin û yêdin û yêdî sûcdar bikin!

Gelo hevahengiyek di navbera hêzên siyasî yên çar parçeyên Kurdistanê de heye? Heke em wê eslê li ber çav bigirin ku bûyerên parçeyên Kurdistanê bandora rastewxwe û nerastewxwe li ser hevdu hene, girîngiya hebûna wê hevahengiyê heyatî û faktorekî diyarker e.

Bûyerên çend mehên borî careke din bi zelalî nîşan da ku aliyên biryarder ên şer, nizanin li Rojhilatê Kurdistanê muxatebê wan kî ye û berê xwe bidin ku derê. Werin li şûna ku em axê li çavên xwe bikin, bi hêza xwe ya yekgirtî li ser wê rewşê zal bibin.

# Hewcehiya rawestana li dijî darvekirin û parastina canê girtîyên siyasî!



N. Îbrahîm Lacanî
W. Sîmîn Rûhanîzade




Di wan heftî û mehên dawî de, rewşa mafên mirovan li Îranê heta diçe zêdetir dibe cihê nîgeraniyê. Nûçeyên ku ji navxweyê welat tên belavkirin, nîşan didin ku pêvajoya darvekirin û cezaya îdamê ya girtîyan bi lezgîniyek zêde berdewam e.
Gelek ji girtiyên siyasî û kesên ku di tevgerên nerazîbûna xelkê de hatine girtin, niha bi metirsiyeke cidî û nêzîk a darvekirinê re rûbirû ne.

Ev tenê li derheq wan kesan nîne ku di xwepêşandan û tevgerên dawî de beşdar bûne û hatine girtin, belkî ew girtîyên ku çendîn salin bi tohmetên siyasî di girtîgehan de ne û niha piştî demeke dirêj a bêdengiyê ji aliyê dezgeha dadweriyê ya rejîmê ve tên cezadan û cezayên giran bi ser wan de tên sepandin.

Piştî ragihandina agirbestê di navbera Amerîka û Komara Îslamî de, çavnihêriya vê yêkê dihate kirin ku rewşa ewlehî li Îranê û bi taybetî li Kurdistanê de kêmtir bibe. Lê hemû belge nîşan didin ku ne tenê zilim û tepeserkirin kêm nebûye, belkî li hemû Îranê û bi taybetî li hin herêman zêdetir jî bûye.

Girtin û birina xelkê, danîna xalên vekolînan li şeqam û kolanan û cihên giştî, sepandina cezayên giran li ser girtîyan, çavdêriya polîsan li ser her cure çalakiyên medenî, qutkirina înternetê û sepandina tarîtiya dîcîtalî li ser xelkê, givaş û zext li ser malbatên girtîyan, gef xwarin li rojnamevan û çalakvanên siyasî û medenî, hemû wek nîşaneyên tundtirbûna siyaseta ewlehiyê û milîtarîzekirin û tepesrkirinê tên hesibandin.
Ev rewş, li Kurdistanê pir berfirehtir û tundtir e. Rejîm herdem Herêma Kurdistana Îraqê bi mûşek û dronan bombebaran dike. Kampên partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li Başûrê Kurdistanê tên armanc girtin û bi mûşekan tên lêdan, û bi wê sedemê heta niha gelek kes aware û mişextî bûne û hejmarek jî şehîd û birîndar bûne ku di nav wan de jin û zarok jî hene. Ev yeka binpêkirina yasa û normên navneteweyî ye.
Di heman demê de, nûçeyên nîgeranker li derheq rewşa nava girtîgehan de belav dibin. rewşa jiyan û derbaskirina rojane di girtîgehan de, digel standardên cîhanî û prensîpên mafên mirovî yek nagire. Girtî di rewşên ne saxlem, qerebalix û bê îmkanat de hatine ragirtin.

Ji xizmetguzariyên dermankirin û tenduristiyê hatine bêparkirin, û di bin givaşên hindirî û cesteyî de ne, tên îşkence û eziyet kirin, Nikarin parêzerên serbixwe hebin, Ji bo demeke dirêj di bin lêpirsîn û lêkolînan de tên hiştin, Li malbatên wan gef tên xwarin û bo cihên nediyar tên veguhestin.
Tevî hebûna wê rewşa nebaş ku me bas kir, rejîmê pêla nû ya girtin û tirsandina xelkê dest pê kiriye.

Çalakvanên jîngehî, çalakvanên medenî, kedkar, xwendekar, mamoste û hemû ew kesên ku berevaniyê ji azadiya mirovan dikin, bi kom tên girtin û bo girtîgehan tên veguhastin. Eva nîşan dide ku ev tepeserkirine tenê li dijî çalakvanên siyasî nîne, belkî gelek ji çalakvanên medenî, pîşeyî û sendîkayî jî li xwe digire.

**Di rewşeke wiha de, divê civaka medenî, kom û saziyên parêzer û alîgirên mafên mirovan û raya giştî ya navxwe û derveyî welat, ji bo rawestandina vê rewşê roleke çalaktir bilîzin.**

Parastina girtîyên siyasî û sekinîn li dijî darvekirinê, ne tenê berpirsiyariyeke exlaqî ye, belkî gaveke hewceye ji bo parastina rûmet û kerameta mirovan û pêşîgirtin ji zordarî, tepeserkarî û tundûtûjiya dewletî. ezmûna welatên din û ezmûnên me xwe jî nîşan didin ku givaşa navxweyî û navneteweyî gelek caran dikare pêşî li cîbicîkirina cezaya darvekirinê bigire û bibe sedema baştirbûna rewşa nav girtîgehan de.

Kom û saziyên navneteweyî, sendîka û yekîtiyên kedkarî û pîşeyî, rêxistinên jinan, ciwanan, xwendekaran û hemû alîgirên mafên mirovan, dikarin di vê derheqê de çalakî û hewildanên hevaheng hebin, dikarin daxwaza şandina komîteyên navneteweyî ji bo serdana girtîgehan bikin, dikarin daxwaz bikin ku welat û dewletên din givaşên dîplomatîk li ser Îranê zêde bikin, daxwaza baykotkirina berpirs û karbidestên rejîmê bikin, dikarin malbatên girtîyên siyasî biparêzin û bi belavkirina daxuyanî û nivîsandina raporan li derheq rewşa girtiyan de, bibin sedema kêmkirina givaşa derûnî û cesteyî li ser girtîyên siyasî û girtîyên din ên tevgerên nerazîbûnê.



Di dawiyê de divê em balê bikişînin ser vê yekê ku parastina girtîyên siyasî û sekinîn li dijî darvekirinê, beşek ji berpirsayetiya me ya hevpara e.

Dema ku piraniya wan girtîyane nikarin dengê xwe bigihînin derve, li ser me hemûya hewceye ku em bibîn dengê wan û hawara wan bigihînin cîhanê.

Heta ku sepandin û cîbicîkirina cezaya darvekirinê neyê sekinandin, îşkence di girtîgehan de bi dawî neye û girtîyên siyasî neyên azadkirin, kar, têkoşîn, hewl û xebata me di vê pêywendiyê de divê her berdewam be.

Parastina rûmet û keremeta mirovan û maf û azadiyên bingehîn ên mirovan, erkek e ku di ti rewşekê de nabe bê ji bîr kirin.

# Rêjîma demkuj



N. Azad Kurdî



Piştî 40 rojan hêrişên berfireh yên Amerîka û Îsraîlê bo ser rêjîma Îranê û ragehandina agirbesta demkî bona gihîştin bi lihevhatinekê ligel rêjîmê, bo hemû cîhanê derket dolê ku rêjîma Îranê armancên çêkirina çekên Etomî û berfirehkirina bernameyên mûşek û dronan bo ne ewlekirina herêmê heye, bona vê yekê jî tenê bi kuştina demê, dixwaze wan armancan bidest bixe.

Hêrişên 40 rojî yên Amerîka û Îsraîlê bo ser binke û hêzên rêjîma dîktator a Îranê, hema rêjîm nîv canî kir.

47 sal bûn ku rêjîm neketibû ber lêdan û hêrişên wiha cergbirr. Serokê wê yê olî û fermanderên herî payebilind ên rêjîmê hatin kuştin û bi sedan karbidestên din ên rêjîmê jî hatin jinavbirin ku destê wan di kuştin û qirkirina gelên Îranê û di welatên din de jî hebû bi navê belavkirina eniya Şîe.

Ev yek jî encama siyasetên wan yên şerxwazane û gefkirin li xelkê herêmê û hemû Rojhilata Navîn bû, bi taybet jî ewlehiya Îsraîlê.

Rêjîmê bo dema 47 salan karîbû şerê xwe ligel Amerîka û bi taybet jî Îsraîlê di nava axa welatên din weke Lubnan, Yemen, Sûrye, Iraqê de bimeşîne û qada şer û pevçûnan li coxrafiya xwe dûr bike.

Lê sala 2025'an piştî hêrişên terorîstî yên 7'ê Oktoberê, sebra Îsraîlê bi dawî hat û çû dû serê marî li Tehranê.

Îsraîlê hêrişên cergbirr û mezin li rêjîmê dan ku 46 sal bû rêjîmê bi çavên xwe nedîtibû.

Di rastî de beşeke sereke ya alozî û ne ewlehiya herêmê di 4 dehsalên berê li Rojhilata Navîn berhema siyaset û projeyên rêjîma Îranê bûn.

Rêjîmê herwiha di asta navxwe de bi avakirina sîstemeke ne demokratîk û 100 li sedî daxistî, karî hemû tevgerên azadîxwaz li navxweyê Îranê jî kontrol û qedexe bike.

Lê rêjîm di yek tiştî de nekariye qet hemû armancên xwe li navxwe bidest bixe, ev jî hebûna tevgereke neteweyî ye li Rojhilatê Kurdistanê.



Lewma jî di qonaxa agirbestê jî bo yek roj dest ji hêriş b oser hêzên Rojhilatê Kurdistannê bernedaye.

Xuya ye ku rêjîm li Amerîka û Îsraîlê zêdetir, ji hebûna tevgera Kurdistanê ditirse.

**Di mehên yekem yên bidestve girtina desthilatê de hetanî niha, Kurdistan herdem çepera azadîxwaziyê bûye û qet xebat û berxwedan neteweyî ya Kurdan nesekinî li dijî zordariya vê rêjîmê.**

Sedem jî ev yek bûye ku partiyên siyasî yên kurdî li Rojhilat û bi taybetî PDKI bingeheke kûr di nava dilê civaka Kurdistanê de hene.

Rêjîmê bi çêkirina sîstema caşatî û kirêgirtîkirina hindek kesên xwefiroş jî nekarî bi tevahî xebat û tevgera Kurdistanê rawestîne.

Tevlîbûna sedan keç û xortên kurd di salê de bo refên hêzên Pêşmerge li Rojhilatê Kurdistanê, vê rastiyê diselimîne ku tevgera kurdî li Rojhilat û civaka Kurdistanê weke av û masiyan in.

Lewma jî ligel ragehandina agirbesta demkî ku tenê bona kirîn û kuştina demê bû ji aliyê rêjîmê ve, her roj rêjîma li pêşberî civaka navdewletî binkeyên hêzên Rojhilatê Kurdistanê dide ber hêrişên mîşek û dronan, çendîn şehîd û birîndar hebûne.

Hemû jî kir û bêdneg û bê helwêst in li hember van siyasetên şerxwazane yên rêjîmê.

Di vê navberê de tişta herî ecêb e, ev yek e ku hêzên Rojhilatê Kurdistanê weke penaber li Herêma Kurdistanê de dimînin û mafên parastina wan divê bihê misogerkirin di çarçoveya dewleta federal a Îraqê, lê mixabin welatê Iraqê qet bi daxuyaniyekê jî be heta li hember binpêkirina serweriya axa xwe jî be, ev hêriş şermezar nekirine, çi bigihîje vê yekê ku di asta navdewletî de zextan pêk bîne bo ser rêjîma Îranê û dozê li Neteweyên Yekbûyî li ser rêjîmê tomar bike bona binpêkirina serweriya vî welatî ji aliyê Sipaha Pasdarên rêjîma Îranê ku weke hêzeke terorîst di cîhanê de tê naskirin.

Bi salan bû ku hêzên siyasî yên kurdî li Rojhilat li ser fêlbazî û siyasetên rêjîmê raya giştî ya cîhanê agahdar dikir ku ev rêjîm dixwaze bomberyên Etomî çê bike, bernameya mûşekên dûravêj pêşde bibe û bi rêya Sipaha Quds bi milyonan Dolaran salê hevkariyên aborî û çekan dide kom û hêzên ser bi rêjîmê li hemû Rojhilata Navîn û cîhanê û kiryarên terorîstî li cîhanê û bi taybet li Ewropayê rê bixe.

Ev hemû hişyarîdan û agahdarîdan hemû rast derketin û civaka navdewletî bi çavên xwe dît ku çawa ev rêjîma metirsîdar bo ser aştiyê dikare hemû herêmê û cîhanê aloz bike.

# Gola Urmiyê, Di navbera mirina siyaset û jiyana xwezayê de



N. Serbest Urmiyê



Di dîroka neteweyan de gelek caran hatiye dîtin ku nemana dîktatorekê ne tenê dawiya desthilatdariyeke zordar bûye, belku bûye destpêkek bo ji nû ve jiyana mirovan û jîngehê. Dema ku tê gotin “mirina dîktator destpêka jiyanê ye”, ne tenê şiroveya hesteke xweş e ku di dil û hindurê gelê bindest û civaka zor lêkirî de serhildide.

Şiroveya vê hevokê di hevkêşeya Gola Urmiyê de, wateya xwe ya rastîn verdigire. Rastiyek ku him di warê siyasetê de û hem jî di qada jîngehê de bi bandor e û nayê înkarkirin.

**Gola Urmiyê, goriyê sepandina ramaneke pêş ve hatî**

Bi salan e ku Urmiye bi eşkere goriyê siyasetên gendel, rêveberiya nezanistî û helwestên kolonyalîstî ên dagîrkerên xwe ye. Nêrînek çewt ku ji xwezayê ne wekî bingeha jiyanê, belku tenê weke çavkaniya berjevendiyên demkurt mêze dike. Hişkbûna Gola Urmiyê nikare tenê di pênaseya karesateke xwezayî de were nasandin, ev danezanîna têkçûna pergaleke siyasî ye ku her tiştî fedayê man û hebûna xwe dike.

Çavkaniyên zanistî yên jîngehê heta niha eşkere kirine ku sedema sereke ya vê karesatê ne guherîna avûhewa û rewşa xwezayê bûye, di rastî de:

- Lêdana bi hezaran bîrên bê destûr û neyasayî
- Zêdebûna qasê bendavan û guhertina rêreva xwezayî ya rûbaran.
- Çandiniya xweser û bê pîlan.
- Û ya herî girîng, nêrînên ewlekarî û hevregirêdana pirsa avê bi hevrikî û berjewendiyên siyasî re. Sedemên sereke bûne bo çikandina Gola Urmiyê.

Dema ku mafiyaya desthilatdar berjewendiyên xwe yên siyasî û ewlehiyê li pêş berjewendiya giştî dixe û zanist û ramanên pisporan paşguh dixe, xweza û jîngeh jî di meydana tolhidanê de gelek be rehim û xedar dibin.

**Encamên zuhabûna Gola Urmiyê**

Zuhabûna Gola Urmiyê ne tenê kêmbûna asta avê, di rastî de pêvajoyeke sîstematîk bo kuştina jîngehê û gefek rastewxwe û tevalî li ser man û jiyana neteweyekê li ser axa xwe û niştecihên herêmê bû. Encama vê rastiyê jî di xalên jêr de te şirovekirin:

**1.** Bahozên sipî û toza xwê: Guherîna demografî û gefa koçberiya girseyî ya nifûsa herêmê.
**2.** Wêrankirina jîngehê: nehêştina jiyandarên xwecih ên deverê, çûk û jiyandarên kêm wêne yên taybetî jingeha Gola Urmiyê.
**3.** Gef li ser saxlemiyê: Zêdebûna nexweşiyên wekî penceşêr û nexweşiyên sî û bêhinkutriyê di herêmê de.
**4.** Giwaşên aborî: bêxişkirina werzêrî û nehêştina zimhêr û debara bi mîlyon kesan.

Mirina Gola Urmiyê ne tenê mirina avê bû, Berevajî vê, ew daxuyaniya hewlekê ji bo kuştina netewe û ji holêrakirina dîrok û nasnameyekê bû.



**Ji nû ve jiyana xwezayê, Dema ku jîngeh xwe nûjen dike**

Nabe rê bê dan ku desthilat vê hêviya ku bi vegeriyana rêjeyî ya avê bo Gola Urmiyê di civakê de geş bûye, weke destkewta sîstema desthilatdariya xwe bide zanîn.

berevajî divêt wekî belgeyekê were şîrovekirin da ku vê rastiyê bide selimandin ku xweza û jîngeh tenê demekê dikarin bêhna xwe vedin ku lepên siyasetên qirêj û zordestiya mirovan pêsîra wan berdin. Ya ku niha tê dîtin hêza xwezayê ye bo xwe nûjenkirin û ji nû ve jiyanê di yekemîn pêngava azadiyê de, ne xêr û bereketa pergalek zordar.

Gefên li ser Gola Urmiyê hîn dawî nehatine. Yek ji metirsiyên herî mezin talankirina siyasî ye. Rejîm, an jî bermahiyên rejîma dagîrker, li gor morala xwe ya hertimî, hewil dide ku hêma û destkewtên xwezayê jî weke hêma û destkewtên neteweyên dagîrkirî bi navê xwe zevit bike û bi propagandaya siyasî ji bo veşartina bi dehan salan dizî, talankirin û sûç di vî warî de, wekî serkewtineke stratejîk a rejîmê bihesibîne û bide nav çavê gel.

Heta ku mercên bingehîn bo rizgarkirina wê golê nehên bicîhanîn, çî hêviyek bo vejiyana wê nahê dîtin. Mercên weke:

**1.** Ji holêrakirina mafyaya avê, guherîna bingehîn a sîstema gendel ku di biyava man û berdewambûnê de, ticaretê bi avê jî dike.
**2.** Guhertinên bingehîn di pergalên rêveberiya avê de
**3.** Darêtina pilanên zanistî û jîngehparêz bêyî destwerdana siyasî
**4.** Beşdariya rastîn a xelkê herêmê di pêvajoya biryardanê de

**Jîngeh û demokrasî: du têgehên bi hev re girêdayî**

Ezmûna tal a Gola Urmiyê da selimandin ku parastina jîngehê bêyî demokrasiyê ne mumkin e. Di civakekê de ku rojnamevan nikarin serbest rexnê bigirin, lêkolîner û pispor tênê xewlekirin û gel di biryarên girîng de çi rolekê nalîze, xweza jî di bêdengiyê de û ji ber toza çekmeyên dagîrkeran tê fetisandin. Talankirina xwezayê doma talankirina azadiyên mirovan e.

Di bin siya vê rastiyê de, «mirina zordar» nabe di çarçoveya nemana fîzîkî ya kesekî zordar de were sînordar kirin. Berevajî dibe ku bibe daxuyaniya mirina raman û pergalekê ku ji xweza û mirovan tenê wekî amûrê parastina hêza xwe dinihêre.

Di heman demê de jî divê ku bibe carnameyek ji bo selimandina vê rastiyê ku jiyana bi rûmet a mirovan û jîngehê demekê destpê dike ku zelabûn, zanist û serweriya mirovan dewsa tirs, zordestî û tepeserkirinê bigirin.

**Di dawiyê de**

Gola Urmiyê hîn jî di navbera jiyan û mirinê de berxwe dide. Lê destana vê gola avê yê bûye waneyek ji bo civakê û rastiyekê dide xuya kirin ku xweza li hember zilm û zordariyê de bêdeng namîne. Gola Urmiyê diqîre û dibêje: «Dema ku siya zilmê li ser jîn û jîngehê rabe, jiyan dê di dilê erdê de dîsa şîn bibe û çilû bide.»

## Nerîna Lîderan




**“Mistefa Hicrî”:**

**“Rejîm Gihîştiye Binbestê û Nikare Vegere Rewşa Beriya Şer.”**




**“Donald Trump”:**

**“Em ê şerê ligel Îranê gelek bi lez bi dawî bînin.”**



**“Lindsey Graham”:**

**“her rêkeftinek ligel Îranê dibe ji aliyê Kongirê ve bê pejirandin”**



**“Alexus Grynkewich”:**

**“Vekişîna Amerîkayê ya ji Ewropayê bandorê li planên ewlehiyê nake.”**

# Serokwezîrê nû yê Îraqê heya çi qasekê dê bikare serbixwe biryarê bide?



**N. Eskender Ceiferî**




Niha, bi pêşketinên siyasî yên nû li Bexdayê û zêdebûna givaşa Dewletên Yekbûyî yên Amêrîka ji bo sînordarkirina bandora komên girêdayî bi rêjîma Îranê, ev pirs careke din derketiye holê: ku gelo Îraq û Herêma Kurdistanê dikarn bê destêwerdana rêjîma Îranê rêya aramî û geşekirinê bigirne pêşya xwe û derbas bikin? Tişta ku li ser rûyê erdê hebû, ev bû ku di salên dawî de, Îraq, û bi taybetî Herêma Kurdistanê, bi awayekî berdewam bûne qurbaniyên hevirkiyên navçeyê û siyasetên destêwerdana rêjîma Îranê.

Li gor raportên vê dawiyê yên ragihandinên navnetewî û navçeyê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ji serokwezîrê nû yê Îraqê xwastiye ku gavên “bi biryar û berbiçav” bavêje û xwe ji çekdarên girêdayî rêjîma Îranê dûr bigire.

Ev daxwaz ne tenê helwêstek siyasî ye, belkî di heman demê de tevgereke gelek micid û berifreh li djî wan komên çekdar nîşan dide ku ji hêla Spaha Pasdarên Têrorîst ên rêjîma Îranê ve têne piştevanîkirin.

Hikûmeta Amêrîka li ser vê baweryê ye ku bandora berdewam a çekdarên girêdayî rêjîma Komara Îslamiya Îranê ne tenê dê ewlehiya Îraq û Hermêma Kurdistanê têk bide, belki di heman demê de dê ji nû ve avakirina aborî û normalîzekirina têkiliyên Bexdayê bi cîhana Ereb, zilhêzan û herwisa bi welatên rojava re jî asteng bike.

Di vî warî dê, têkiliyên rasterast ên di navbera rayedarên Amêrîka û Elî El-Zeydî, serokwezîrê destinîşankirî yê Îraqê de xuya dikin ku peyama Waşîngtonê ew e ku Amerîka dixwaze Îraq serbixwetir û dûr ji hêla rêjîma Îranê be.

Di salên borî de dihat dîtin ku hertim Îranê hewl da bi toreke komên çekdar û bandora siyasî, Îraqê bike beşek ji projeya xwe ya xwe tirsandin, bacgirtin û têrorê li navçeya Rojhilata Navîn de.

Encama vê siyasetê belavbûna gendeliyê, qeliskirina saziyên rêjîma Îranê, zêdebûna pevçûnan û herwisa nearamiyê û veguherandina Îraqê ji bo qada şer bû. Herêma Kurdistanê jî bi sedema vê rewşê bi giranî ketiye bin bandorê; ji êrîşên bi hajek û dronan bigire heya zextên siyasî û aborî.

Dema aloziyên vê dawiyê yên di navbera rêjîma Îran û Amêrîka de, hin deverên li Hewlêr û Silêmaniyê jî ji aliyê Îranê ve rastî êrîşan hatin.

Hin êrîşên dronan ji aliyê komên nêzîkî rêjîma Îranê ve hatine kirin, ku ji bo ser aramî û ewlehiya Herêma Kurdistanê gefên gelek mezin û bihêz in.

**Di demekê de ku Herêma Kurdistanê hewl daye ku modêlek cûda ji bo pêşkeftin, aramî û herwisa mînakek ji bo kişandina veberhênanê li herêmê be, destêwerdana rêjîma Tehranê her gav ji bo Herêma Kurdistanê astengî bûye.**

Ji ber ku Tehran dizane, heger rewş li Herêma Kurdistanê nearam be, hin veberhênerên biyanî ji ber gefên li ser ewlehiyê û bandora çekdarên ku ji hêla Îranê ve têne piştgirîkirin, ji Îraq û Kurdistanê dûr dikevin.

Ger Îran destêwerdana li Îraq û Herêma Kurdistanê rawestîne, Kurdistan dikare bibe yek ji navendên aborî û geştyarî yên herî girîng li navçeya Rojhilata Navîn.


Herêma Kurdistanê xwedî çavkaniyên xwezayî yên berfireh, chekî erdinîgarî yê stratêjîk, hêza ciwan û têkiliyên erênî bi welatên rojava û Ereb re ye.

Kêmkirina bandora rêjîma têrorîstên Tehranê dikare rê ji bo veberhênana biyanî, pêşxistina pêşesaziyê, berfirehkirina bazirganiyê û aramiya siyasî xweş bike.
Pêşeroja Îraq û herwisa Herêma Kurdistanê bi avakirina hikûmetek serbixwe li Bexdayê ve girêdayî ye; hikûmetek ku ji bo wê, berjewendiyên neteweyên Îraqê girîng in neku xwastekên rêjîma terorîstên Tehranê.

Îro Îraqî û Kurd hêvî dikin ku welatê wan bikare ji qada pêşbaziyên Îran û hêzên herêmî dûr be.

Kurdistan dixwaze li ser pêşkeftin, serfirazî û ewlehiyê berdewam be.

Bê guman bêyî destêwerdana rêjîma Îranê, ne tenê Îraq, lê tevahiya navçeyê dikare jiyanek nû bibîne û derbasî qonaxa aramiyê bibe.



**Di vê hejmarê de me li ser rewşa hindiriya xelkê Îran û Rojhilatê Kurdistanê piştî şerê vê dawiyê û tepeseriyên rejîma Îranê digel rêzdar Dr. Mecîd Heqî Çalakvanê Siyasî hevpeyvîn encam daye.**



Hevpeyvîn. Dr. Mecîd Heqî

Hevpeyvînkar. Sîmîn Rûhanîzade

**1 - Bi nêrîna we, şerê di navbera Amerîka, Îsraîl û Îranê de çi bandorek li ser hesta ewlehiya hindirî û hêviya civakî ya xelkê Îranê daniye? Civaka Îranê ya îro ji aliyê hindirî ve di çi rewşekê de ye?**

Wek kesekî ku bûyerên Îranê dişopînim, ez bawerim ku aloziyên heyî û sîberek şer a di navbera Amerîka, Îsraîl û Îranê de, civak xistiye di rewşeke "şûştina derûnî ya zêde û parvebûna pêkhatyî" de.

Ji nihêrîna min, rewşa şer mafê bingehîn ê mirovan ê ji bo jiyaneke ewle û biîstîqrar ji destê wan girtiye; "hêviya civakî" miriye û mirov ji bo jiyana xwe ya rojane di nav tirs û fikareke hebûnî de ne.

Lê xala kilît a ku divê neyê piştguhkirin, aliyê aborî û cudahiya sîstematîk a di navbera navend û herêman de ye. Sîbera şer qeyranên aborî girantir kirine, lê barê giran û piştşikên ê vê rewşê li ser milê neteweyên bindest û herêmên li dervayî navendê ne, wek Kurdistan, Belûçistan û El-Ahwazê. Cudahiya sîstematîk bûye sedem ku hejarî û bêkariyê li van herêman çend qatî ji navendê zêdetir be. Di rastiyê de, ev gel rûbirûyî zilmeke ducar bûne.

Bi kurtasî, civaka îro ya Îranê ji hundur de civakeke gelekî westayî, neyeksan û li ber teqînê ye, di bin çermê wê de, qelişînên kûr di navbera navend û neteweyên li derdorê de çêbûne.

**2 - Di rewişa şer û gefên leşkerî de, givaşên aborî, qutbûna înternetê, bêkarî û ne ewlehbûna kar û zêdebûna rêjeya koçberiyê çi guhertinek di şêwaza jiyan û pêwendiyên civakî ya xelkê Îranê de çêkirine?**

Em rûbirûyî diyardeya "derbasbûna ji civaka serfkar ber bi civaka li-serpêyan-manê bûne. Ev qas zextên ku li hev diqelibin, pêkhatên mezin ên jîngehî û derûnî yên mirovan di du qatan de guhartine:

Yekem: Pênasekirina nû ya şêwaza jiyanê di rewşa awarte de: Di qata şêwaza jiyanê de, zirara herî mezin "kurtbûnasoya plansaziyê" ye. Di şert û mercên ku gefên leşkerî û bêîstîqrariya aborî heye, plankirina ji bo pêşerojê cihê xwe dide neçariya jiyîna di wextê niha de. Mirov êdî ji bo 5 salên pêş de plansaziyê nakin, belku stratejiyên xwe bi rojane an heftane ava dikin.

Ji aliyê din ve, bi qutkirina înternetê û neewlehiya kar re, em dibînin ku kar nemaye. Înternet li Îranê êdî ne amûreke lîstik û wextbihorandinê ye, belku emraz û rêka debar û nan peydakirina xelkê ye, lewra jiyana malbatan gelekî dijwar kiriye.

Duyem: Şûştina sermayeya civakî û guhertina têkiliyan

Di qata têkiliyên civakî de, em rûbirûyî du diyardeyên dijber lê hemwext dibin: "Kesayetiya parasbûna manê" û "Hevgirtina giravî".

- Kesayetiya parasbûna manê: Ji ber kêmkirina çavkaniyan û neewlehiya giran, tixûbê taba derûnî ya civakê kêm bûye; encama vê yekê jî zêdebûna aloziyên navmalbatî, telaq û geşbûna bêbaweriya giştî ye di asta giştî ya civakê de.

- Hevgirtina giravî: Lê di xaleke din de, ji ber ku mirov hîs dikin piştgiriyên pergalî têrê nakin, ber bi avakirina peywendiyên kûrtir di nav komên piçûk û paralî de, mîna dostên nêzîk an torên piştgiriyê yên herêmî diçin, heta ku bikaribin barê van qeyranan bi hev re parve bikin.

Di dawiyê de, diyardeya koçberiya berfireh, Civak berdewam hîsa winda kirinê û ji bo kesên xwe yên nêzîk ên ku welat biterkînin, dijî.

Bi kurtî, van şert û mercan hiştiye ku civaka Îranê li ber xwe bide û berxwedaneke mezin (Resilience) nîşan bide, lê ev berxwedan li ser hesabê westandina giran a derûnî, îzolasyona civakî û kêmkirina kalîteya jiyana dîjîtal û fîzîkî bi dawî bûye.

**3 - Bi nêrîna we, Rejîma Îranê çawa keşa şer û kirîzên derve ji bo kontrolkirina civakê, tepeserkirina dijberan û raya giştî bikar tîne?**

Dema ku em li reftara hikûmeta Îranê di demên qeyranên derve an di bin sîbera şer de dinêrin, em modelekî dubarebûyî dibînin: "Navxweyîkirina qeyranên derve ji bo xurtkirina desthilatdariyê".

Hikûmet rewşa şer ne tenê wekî gefekê, belku wekî derfeteke zêrîn dizane ji bo pêşvebirina projeyên tepeseriyê bikar tîne.

Em dibînin ku tam di lûtheya qeyranên leşkerî de, amara îdamên siyasî gelekî bilind dibe. Dosyayên ku bi mehan an salan sekinandibûn, ji nişka ve di dadgehên rêjîmê de dikevin ber cîbicîkirinê.

Projeyeke din a ku di dema şer de dest pê dike, "paqijkirina pêşwext" e. Saziyên ewlehiyê bi vê gumanê ku çêbûna şer dibe ku bibe çirûskek ji bo xwenîşandanên nû yên seranserî dest bi girtineke berfireh û bikom dikin.

Yek ji amûrên herî berçav ên kontrolkirina civakê di vî heyamî de, televîzyon û medyayên fermî yên dewletê ne. Em rûbirûyî "mîlîtarîzekirina medyayî" dibin. Amadebûna fermandarên leşkerî bi kincên şer û çekan di studyoyên zindî yên televîzyonê de, weşandina berdewam a fîlmên senedî yên mûşekan û manovrên leşkerî, ne tenê peyamekê didin derve, muxatabê van bernameyan civaka navxweyî ye.

**4 - Ji nêrîna civaknasiyê ve, domandina şer û rewşa ewlehiyê çi bandorekê li ser pêvajoya hilweşîna civakî, radîkalbûna civakê û egera destpêkirina xwenîşandanan di pêşerojê li Îranê dê bike?**

Berdewamiya vê rewşê, di dema navîn û dirêj de, dînamîkên civakî yên di nav Îranê de ber bi aliyekî cihê tiresê ve dikişîne ku mirov dikare di sê qatan de şirove bike:

1. Lezandina pêvajoya hilweşîna civakî

Encama herî mezin a berdewamiya rewşa ewlehiyê û nîv-şerî, xerabûna "çirîska civakî" yan jî heman sermayeya civakî ye. Dema ku civak bi awayekî pûçker di nav qeyranên aborî û gefên leşkerî yên ji ber aloziyên herêmî de dimîne, diyardeya "etomîze bûnê" çêdibe.

Di vê rewşê de, mirov ji çîrokên mezin ên neteweyî û hevgirtinên sivîl bêhêvî dibin û dikişin nav qatên xwe yên taybet. Dema ku civak atomîze bû, saziyên navbeynkar mîna partî, sendîka û rêxistinên sivîl ji nav diçin û civak bingeha xwe ya exlaqî winda dike. Berdewamiya vê rewşê, Îranê rûbirûyî xetera diyardeya "civaka talanker"ve dibe.

2. Radîkalbûna neçar a civakê

Dema ku rêyên qanûnî yên xwenîşandanê girtî bin, girtinên bikom çêbin û îdam wekî amûrê serekî yê kontrolkirina civakê werin bikaranîn, zimanê diyalogê di navbera gel û desthilatê de bi temamî qut dibe. Wê demê, kerbê pendavxwarî şêwaza xwe diguhere. Civaka ku bi salan sivkayetî, hejartî û gefa şerê navxweyî ceribandiye, digihîje wê encamê ku guhertin bi rêyên aştiyane ne mumkin e. Di encamê de, reftara nifşên nû yên nerazî gelekî radîkal dibe.

3. Guhertina hûner û forma xwenîşandanên pêşerojê

Hinek kes difikirin ku afirandina tirs û xofê di medyayê de xwenîşandanên herdemî bêdeng dike; lê sotsyolojiya serhildanan nîşan dide ku ev rewş tenê dema çêbûna xwenîşandanê paş de dixe, lê di rû de, enerjiya wê ya teqînê çend qatî zêde dike.

Berdewamiya vê rewşê di rastiyê de civaka Îranê ber bi teqîneke mezin ve dibe, ku tê de îhtîmala derbasbûna aştiyane û demokratîk gelekî lawaz dibe û cihê xwe dide senaryoyên rûbirûbûna hişk û wêranker.

**5 - Ev şer û siyaset û zêdexwaziyên rejîma Îranê çi bandorek li ser pêşeroja Zarokan û ciwanan, bi taybetî jinan, xwendekaran û çîna navîn li Îranê heye?**

Dema ku welatek çavkaniyên xwe li şûna pêşveçûna navxweyî, perwerde û binesaziyê, di ber daxwazên leşkerî û şerê niyabetî de xerc dike, pêşeroja van çar koman tûşî qutbûnên kûr dibe:


Berdewamiya sîbera şer û neewlehiyê, berî her tiştî ewlehiya derûnî ya zarokan û pêşeroja ber çavên ciwanan xira dike.

Encama vê siyasetê, mehandina herî zêde ya jinan ber bi herêma dervayî aboriyê, zêdebûna rêjeya bêkariya jinên xwende, û binpêkirina mafên wan e. Tevî vê yekê, ev zext potansiyela protestoyî ya jinan kor nakin, belku wê dikin êşeke mayînde di laşê sîstemê de.

Zanîngeh li Îranê her dem çepera serekî ya aqilmendî û xwenîşandana sivîl bûye. Di şert û mercên şer û ewlehiyê de, projeya "leşkerîkirina zanîngehê" lezê digire. Girtinên bikom û pêşwext ên xwendekaran, karûbarê zanistî û rexnegirî yê zanîngehê xira dike.

Rêjîma Îranê bi lawazkirina qata navîn, leşkerîkirina zanîngehê, rûniştandina jinan li malê û bêhêvîkirina ciwanan, dibe ku di dema kurt de kursiya desthilata xwe biparêze, lê civakê ber bi rewşekî tevlîhev ve dibe. Civaka ku tê de elîtên wê diçin, qatên wê hejar dibin û zarokên wê bi tirsa şer mezin diben, di pêşerojê de dê rûbirûyî qeyrana şaristanî bibe; meger ku ev enerjiyên tepisandî, di zivirîneke dîrokî de, form û rêyeke cuda ji bo diyarkirina pêşeroja xwe hilbijêrin.

# Lihevkirina bêdeng a di navbera zilhêzan de, gelo Çîn xwe ji Îranê dûr dixe?



N. Hesen Mukerem



Serdana vê dawiyê ya Donald Tiramp serkomarê Amerîka bo welatê Çînê dikare weke yek ji girîngtirîn û tevlihevtirîn lîstikên siyasî û aborî yên cîhanê di sala 2026an de bê hesibandin, serdanek ku dibe weke civînek bilindtir li dîplomasiyek asayî were nirxandin û ez li ser vê baweriyê me ku Waşîngton û Peken hûndirî qonaxek nû ya bazirganî û rikeberiya demê de ne.

Girîngiya vê serdanê hîn bêtir aşkere dibe dema ku Tiramp ne tenê bi şandeyek siyasî û ewlehiyê, lê di heman demê de bi komeke mezin a ji rêveber û sermayedarên navdar ên Amerîkî re serdana Pekenê kir; kesayetiyên ji mezintirîn kompaniyayên teknolojî, enerjî, pîşesaziya pêşkevtî û bazarên aborî li Amerîkayê, hebûna wan peyamek zelal ji Çînê re bû: Amerîka amade ye ku rê li ber hevkariya aborî ya berfirehtir bi Pekenê re veke ger lihevkirinên siyasî yên mezin werin bidestxistin.

Ev serdan di demekê de pêk hat ku têkiliyên di navbera Çîn û Amerîka yê de di salên dawî de pir aloz bûne, ji şerên gumrikê û rikeberiya teknolojiyê bigire heya krîza Taywanê, Deryaya Başûrê Çînê, û nakokiyên li ser Îran û Rojhilata Navîn.

Lê di heman demê de, krîza enerjiyê û fikarên li ser resesyona gerdûnî hişt ku her du hêz bigihîjin wê encamê ku berdewamiya aloziyên bêkontrol dikare ji bo aboriya cîhanê û heta ji bo aramiya wan a navxweyî jî metirsîdar be.

Ji ber vê sedemê, gelek siyasetvan li ser vê baweriyê ne ku Tiramp di vê serdanê de du armancên sereke şopandin: ya yekem, kêmkirina aloziya aborî bi Çînê re û çêkirina peymanên bazirganî yên mezin, û ya duyemîn, hewl bide ku hêdî hêdî Pekenê ji Tehranê dûr bixe û piştgiriya Çînê ji bo rejîma Îranê sînordar bike.

Di mehên dawî de, Amerîkayê bi berdewamî zext xistiye ser Çînê, ji ber kirîna petrola rejîma Îranê û hin hevkariyên aborî û stratejîk ên bi Tehranê re.

Waşîngtonê heta hejmarek kompanî û torên veguhastinê yên têkildarî bazirganiya petrolê ya Îran-Çînê ceza kirin û hişyarî da ku her alîkariyek leşkerî an teknolojîk a hesas ji bo Îranê dikare bi bersivek tund a Amerîkayê re rû bi rû bibe.

Niha, xuya dike ku dewleta Tiramp hewl dide ku hêza aborî ya Amerîkayê û balkêşiya bazara Ewrupa bikar bîne da ku Çînê bikişîne nav hin peymanên mezin û dewleta Çînê hem ji Îranê dûr bixe û herwisa Amerîka pir bi başî dizane ku nêzikatiya her roj a Peken û Miskov ê di salên borî de şiyana hêza cîhanî bi zirara welatên Ewropa û Amerîkayê guherandiye û dibe armanca Tiramp ya din jî ev be ku Çînê li hevpeymaniya Rûsiye û Koreya Bakûr jî heta astekê dûr bixe.

Hebûna bi dehan sermayedarên Amerîkî li Pêkenê jî dikare di heman çarçoveyê de were şirove kirin; anku şandina peyamê ji Çînê re ku hevkariya mezintir bi Amerîkayê re dikare feydeyên aborî yên mezin ji Pêkenê re hebin, bi merica ku ew di doza Îranê û hin krîzên jeopolîtîk de hevgirtinek mezintir bi Waşîngton re nîşan bide.

Di vê navberê de, dûr li medya û siyasetên aşkere, îhtîmala peymanek veşartî yan nenivîsandî di navbera Amerîka û Çînê de heye, ku dibe "Îran li beramber Taywanê" de hatibe miamilekirin.

**Li gorî vê şiroveyê, Amerîka hewl dide ku Çînê razî bike ku piştgiriya xwe ya siyasî û stratejîk a berfireh ji bo rejîma Îranê kêm bike, û di berdêla wê de, Waşîngton dê zexta xwe ya li ser mijara Taywanê heta radeyekê kêm bike an jî qet nebe ji zêdekirina aloziyan li ser vê mijarê û dûr bisekine.**

Ev gotina tenê îhtimaleke ji ber ku di berjewendiyên siyasyî yên di navbera mezin hêzan de her tişt mumkin dibe.

Lêbelê, pispor li ser vê baweriyê ne ku ne mimkûn e ku Çîn bi tevahî ji Îranê dûr bikeve an jî Tehranê berde, ji ber ku rejîma Îran ji bo Pêkenê hîn jî girîngiya stratejîk heye.

Çîn beşek girîng a pêdiviyên xwe yên enerjiyê ji herêma Kendavê bi dest dixe, û Îran weke yek ji girêdanên girîng ên projeya "Rêya Ebrîşem ya Nû" tê hesibandin.

Weke din, Pêken têkiliya bi Tehranê re weke kartekê li dijî zextên Amerîkayê bikar tîne û naxwaze ku Waşîngton li Rojhilata Navîn serdest be.

Lê tişta ku mumkin û xuya dike kêmkirina gav bi gav û birêvebirî ya piştgiriya Çînê ji bo rejîma Îranê ye; ev tê vê wateyê ku Pêken dikare têkiliyên xwe yên aborî bi Tehranê re bidomîne, lê xwe ji piştgiriya siyasî û leşkerî ya aşkere an çalakiyên provokatîf ên li dijî Amerîkayê dûr bixe da ku di têkiliyên xwe yên bi Waşîngtonê re pirskirêk çênebe.


Bi tevahyî, ev serdan peyamek girîng ji rejîma Îranê û heta tevahiya herêmê re nîşan dide: ku di siyaseta cîhanî de, berjewendiyên mezin hêzan her gav li pêş dostaniyê û hevpeymaniyên siyasî tên.

Ger Çîn bigihîje wê encamê ku kêmkirina aloziyan bi Amerîkayê re û destpêragihîştina wê ya zêdetir bo bazar û teknolojiya Ewropa û Amerîkayê ji bo pêşeroja wê ya aborî girîngtir e, mumkin e ku ew piştgiriya xwe ya ji bo rejîma Îranê ji nû ve binirxîne.

Di berdêla vê de, dibe ku Amerîka jî di hin mijaran de, di nav de Taywan, nêzîkatiyek hişyartir nîşan bide da ku ji rûbirûbûna rasterast bi Çînê re dûr bikeve.

Ji ber vê sedemê, dibe ku serdana Tiramp bo Çînê destpêka qonaxeke nû ya danûstandinên di navbera her du mezin hêzên cîhanê de be; qonaxek ku aborî, enerjî, Îran û Taywanê bi hev ve girêdide, û dikare bandorên kûr li ser pêşeroja hevkêşeyên li Rojhilata Navîn bike.

# Penceşêr, Zextên Civakî û Pîvanên Siyasî yên Jiyanê li Îranê


N. Sefiye Xalidî



Di salên dawî de, newekheviya gihîştina lênihêrîna bijîşkî - bi taybetî ji bo nexweşên penceşêrê li herêmên xizan ên Îranê - bûye pirsgirêkek mezin a mirovî û civakî.

Li gelek bajar û gundên dûr, kesên bandordar ne tenê bi penceşêrê re, lê di heman demê de bi xizanî, enflasyon û lêçûnên bilind ên dermanan re jî şer dikin.

Wekî din, lênihêrîna bijîşkî ya herêmî ya têrker pir caran tune ye, ku mirovan neçar dike ku ji bo dermankirinê rêwîtiyên dirêj û dijwar bikin.

Ev rewş bi taybetî zextek giran li ser hin herêmên Rojhilata Kurdistanê daniye, ku civak demek dirêj e bi bêparbûna aborî, bêkarî, binesaziya tenduristiyê ya qels û koçberiya pisporên bijîşkî re têdikoşin.

Îro, enflasyona xerabtir, bêîstîqrariya aborî û zextên berfirehtir ên ku ji ber pevçûnên herêmî û aloziyên siyasî hatine afirandin, êşa mirovên asayî zêde kirine.

Lê encamên vê krîzê ji nexweşên ferdî û malbatên wan wêdetir diçin. Ji perspektîfa psîkolojiya civakî ve, civakek ku bi berdewamî şahidê mirinên ku pêşî lê digirin dibe, ne ji ber ne gengaziya dermankirinê, lê ji ber newekheviyê û nebûna gihîştinê, hêdî hêdî hilweşîna psîkolojîk a kolektîf dijî.
Dema ku mirov dibînin ku nexweşîya penceşêrê dikare bibe sedema hilweşîna darayî û nexweşiya bêderman, tirsek veşartî li seranserê civakê belav dibe. Gelek kes bi bêdengî ji xwe dipirsin: "Ger ev yek bi min an bi kesekî/ê ku ez jê hez dikim were, gelo em ê ji hêla darayî ve bijîn? Gelo dermankirin jî mimkun e?" Bi demê re, ev tirs dibe fikara civakî ya kronîk, hesta ewlehiyê ya mirovan qels dike û hêviya ji bo pêşerojê kêm dike.

Di heman demê de, newekheviya gihîştina tenduristiyê hestek bihêz a neheqiyê diafirîne.
Dema ku welatî bawer dikin ku jiyan bi erdnîgarî, dewlemendî, an paşguhkirina siyasî ve girêdayî ye, ew dest pê dikin ku hîs bikin ku jiyana mirovan bi wekhevî nayê nirx kirin.

Ev têgihîştin zirarê dide baweriya giştî û hêrsa civakî, westandina hestyarî, û hestên terkkirinê zêde dike.

Ezmûna dubarekirî ya temaşekirina mirina nexweşên bê dermankirin jî dikare bibe sedema bêhestbûna hestyarî. Psîkolog pir caran vê yekê wekî westandina dilovaniyê bi nav dikin - rewşek ku mirov hêdî hêdî bertekên xwe yên hestyarî yên li hember êşê kêm dikin ji ber ku êş bêdawî xuya dike û ne gengaz e ku were guhertin.
Di rewşên weha de, civak xetera wê yekê heye ku bi xemgînî û windakirinê re rabe, empatî û hevgirtina civakî qels bibe.

Li gelek herêmên Kurdan, kêmbûna navendên penceşêrê yên pispor, lêçûna bilind a sefera bo bajarên mezin, û bihayê dermanan ê zêde, fişarek mezin li ser malbatan ferz kiriye.

Gelek nexweş neçar in ku ji bo dermankirinê bi sedan kîlometreyan rêwîtiyê bikin - rêwîtiyên ku ji bo malbatên kêmdahat ne mumkin dibin.
Ji ber vê yekê krîz ne tenê bijîjkî ye, lê di heman demê de pir hestyarî û civakî ye.
Ji aliyê siyasî ve, ev pirsgirêk ji pirsgirêkek tenduristiyê wêdetir bûye; ew her ku diçe bi pirsên edalet, rêveberî û wekheviya civakî ve girêdayî ye.

Dema ku mirov hîs dikin ku cihê rûniştinê an rewşa wan a aborî şansên wan ên jiyanê diyar dike, mesafeya di navbera civak û saziyên rêveber de mezintir dibe.

Xurtkirina saziyên herêmî û zêdekirina beşdariya civakên herêmî jî dikare rewşê baştir bike.

Bijîşkên herêmî, rêxistinên civaka sivîl, ajansên alîkariyê û komên civakî pir caran pêdiviyên rastîn ên nifûsê ji rayedarên navendî çêtir dizanin.

Dema ku biryarên siyasî bi hev re bi gelên herêmî re têne girtin, ew ê bi rastî pirsgirêkên rastîn ên jiyana rojane çareser bikin.

Di heman demê de, bêyî kêmkirina zexta aborî ya li ser nifûsê, ti reforma tenduristiyê nikare bi ser bikeve.

Enflasyona bilind, kêmbûna hêza kirînê û zêdebûna lêçûnên dermankirinê, dema ku nexweşiyeke giran lê tê, malbatên çîna navîn jî ber bi tengasiyên darayî ve dibin.

Ji ber vê yekê, sîgortaya tenduristiyê ya çêtir, lêçûnên dermankirinê yên kêmtir û aramiya aborî ya mezintir tedbîrên girîng in ji bo derbaskirina vê krîzê.

Lê dîsa jî, tevî van hemû zehmetiyan, gelek civakên bêxizmet berxwedan û hevgirtinek berbiçav nîşan didin.

Li gelek herêmên Kurdan, girêdanên malbatî yên bihêz, torên piştgiriyê yên herêmî, hewldanên xêrxwazî û çandeke alîkariya hevbeş çavkaniyên girîng ên jiyanî yên hestyarî ne.

Ev şêweyên hevgirtina civakî eşkere dikin ku tewra di bin zextek giran de jî, civak li hember hilweşîna tevahî ya psîkolojîk li ber xwe didin.

Di dawiyê de, tenduristiya derûnî ya civakekê ne tenê bi nebûna nexweşiyê, lê di heman demê de bi hebûna edalet, rûmet, ewlehî û hêviyê ve girêdayî ye.

Civatek ku mirov di demên nexweşî û krîzê de xwe terkkirî hîs dikin, hêdî hêdî westandina hestyarî, kêmbûna baweriyê û parçebûna kûr a civakî dijî.

Ji ber vê yekê, misogerkirina gihîştina wekhev a lênihêrîna tenduristiyê û çareserkirina êşên herêmên bêxizmet ne tenê berpirsiyariyek bijîşkî ye, lê di heman demê de pêdiviyek siyasî, psîkolojîk û mirovî ye ji bo aramiya pêşerojê ya civakê bixwe.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Pêlêke nû ya binçavkirina welatiyan li bajarên cuda yên Kurdistanê

Di berdewamiya givaş û binçavkirina sîstematîk a welatiyan ji aliyê rejîma Îranê ve bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê de, di çend rojên dawî de gelek welatiyên Kurd li bajarên Îlam, Pîranşar, Urmiye û Bokan bi awayekî xweserane hatine binçavkirin û heta niha qedera wan nexuya ye.Li gorî rapora Kurdpa ye, roja Duşemî 21ê Banemerê, hêzên ewlehî êrîşkirine ser mala "Seyid Elî Qureyşî", hunermend û stranbêjê navdar ê muzîka folklorê û xelkê bajarê Bokanê binçav kirin.

Herwisa, roja Çarşemî 23ê Banemerê, ciwanekî Kurd bi navê "Mihemedreza Feriyadî" xelkê bajarê "Serawle" ya ser bi parêzgeha Îlamê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate revandin û bo cihêkî nediyar hate veguhastin. Di heman rojê de "Firûzan Newciwan (Îslamî)", mamosteya zimanê Îngilîzî, berpirsa Akademiya Zimanê "Newciwan" û yek ji blogêrên navdar ên bajarê Urmiyê, ji aliyê hêzên ewlehiyê yên rejîmê ve bêyî hebûna belgeyên yasayî hate binçavkirin.

Herwisa, li gorî raporekî din ya Kurdpa yê, roja Pêncşemî 24ê Banemerê, hêzên ewlehî bi awayekî tundûtîjane êrîş kirine ser mala "Sebah Bêware", ciwanê temen 23 salî yê gundê "Kelekîn" a girêdayî bajarê Pîranşarê, û navbirî binçav kirin.



Li gorî zanyariyên hatinî belavkirin, ev çar welatiyên Kurd ji dema binçavkirinê ve heta niha ji mafê parêzer û hevdîtina digel malbatên xwe hatine bêpar kirin.

## Lêborîna Navdewletî: Rêjîma Îranê di sala 2025an de zêdetirî 2 hezar girtî bi dar vekirin e

Rêxistina Lêborîna Navdewletî roja duşemê 28ê Banemerê di rapora xwe ya salane de ragihand ku Komara Îslamî ya Îranê di sala 2025an de, du hezar û 159 kes êidam kirin e. Lêborîna Navdewletî aşkere kiriye ku di sala 2025an de û ji bilî Çînê, herî kêm 2 hezar û 707 kes li seranserê cîhanê hatine darvekirin.

Li gorî wê raporê, amara cîhanî ya sêdaredanê di sala 2025an de li beramberî sala 2024an, zêdetirî du li ser sêyan zêde bûye ku tê de rêjeya sêdaredana welatên wekî Erebistan, Kuweyt, Misir, Yemen û Amerîkayê zêde bûye.

Rêxistina Lêborîna Navdewletî ragihandiye ku Komara Îslamî piştî xwepêşandanên sala borî û destpêkirina şerê Îsraîl û Amerîkayê, cezayê sêdaredanê wekî alavek ji bo tepeserkirina nerazîbûnên sivîl û parastina deshilata xwe tundtir kiriye.

Herwisa ji ber rewşa ewlehî ya navxwe ya Îranê û zehmetbûna destgehiştina bi zanyariyên dirust, rêxistinên din ên mafên mirovan amarên cuda belav kirine; di vê çarçoveyê de, rêxistina "Mafên Mirovan a Îranê", destpêka îsal ragihandibû ku di sala borî de herî kêm hezar û 639 kes li Îranê hatine sêdaredan.




## Hêrana, li destpêka şer ve pitir ji 50 kes di Îranê de hatine bidarvekirin

Rêkxistina mafên mirovî a Hêranayê ragehandiye ku li destpêka êrîşên Amerîka û Îsraîlê bo ser Îranê li 9ê Reşema sala derbasbûyî ve, aliyê kêm 4 hizar û 23 halet ên girtin û 50 haletên bidarvekirinê hatine tomar kirin, ku 32 halet bi tohmeta siyasî û ewlehiyê bûne.

Li gorî raportê, berpirsên Îranê şer bo tundtirkirina rewşa ewlehî, tepeserkirina xelkê medenî û sepandina qutkirina demdirêj a Înternêtê bikar aniye, hevdem rewşa navendên girtîgehê bi awayekî berçav xiraptir bûye û bazgehên hatinûçûnê jî zêdetir bûne.

Ji aliyekî din ve, Ehmedriza Radan, Fermandê hêzên Întîzamiya rejîma Îranê bi fermî ragehandibû ku li destpêka şer ve heta niha, hêzên wan 6 hizar û 500 kes li seranserê Îranê de girtine û tekezî ji vê yekê jî kir ku girtina beşdarbûyên xwenîşandana berê berdewam e.



# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (518)

